

## Rê, lez, dem û lezdanî

### Lez û lezdanî

Lez pîvana ku dibêje ka tiştek bi lez di demek diyar de çiqas dimeşe e. Em dikarin du erebeyên ku bihevre pêşbazî dikin wek nimûne bikar bînin. Di durahîyê de her du erebe wek hev diajon.

Ji bo ku em fêr bibin ka kîjan erebe êdî zûtir diajo, û ji ber vê yekê jî serkeftî dibê divê em li leza binêrin. Ereba ku lezgîniya wî bilindtir e êdî zûtir dimeşe. Ji bo hesabkirina leza ereban, divê em bizanin ka erebe çiqas dûr çûne û çiqas dem bikara anîne. Ji bo hesabkirina leza ereban em formulek bi navê formula lez bikar tînin. Formula lez vê dibêje:

$$\text{Lez} = \frac{\text{Rê}}{\text{Dem}} \quad \text{an jî} \quad v = \frac{s}{t}$$

$$\text{fart} = \frac{\text{vei}}{\text{tid}} \quad \text{eller} \quad v = \frac{s}{t}$$

$v$  = lez e (ji peyva velocity a înglîzî tê, û di wateya lez de ye)


$s$  = durahîye (an jî rê ye)

$t$  = dem e

Yekîneyên hevpar ên ji bo lez km/h og m/s e.

- Yekîneya km / h (h ji peyva hour, û bi înglîzî dem e), vedibêje ka di çend saetan de çend kîlometran tiştek an kesek dur çûye.
- Yekîneya m / s vedibêje ka tiştek an kesek di çirkek de çend metre çûye.

Heger erebekî, di saetekê de 50 km derbas bike, leza erebeyê 50 km / h:



Di hevkeşeya jor de, gava ku em rê bi dem re parve dikin, em leza navin a erebeyê hesap dikin.


Lezdanî pîvanêk ku nîşan dide ka çawa tiştekan bi lez diguhere e, mînak erebeyek çiqas zû ji 0-100 km / h de dikare bimeşe. Dema ku leza erebe diguhere, erebe bi lezdanî dimeşe. Ev hem dema ku erebe lez zêde dike hem jî dema ku lez kêr dike tewe. Heke lez zêde bibe, lezgînî erênî ye. Heke erebe leza xwe kêr bike, lezgînî neyînî ye. Lezdanî bi mêtreyê çîrk bi çîrk tê pîvandî, an jî  $m/s^2$ .

### Hesapkirina rê, lez û dem:

Me jî berê ve dît ku em dikarin formula lez jî bo hesapkirina lez bikarbin. Heke lez û wext zanibe mirov dikare formula lez di hesapkirina ka çiqas tiştekan diherike de jî bikarbîne. Heke lez û rê zanibe mirov dikare formula lez di hesapkirina dem da jî bikarbîne.


### Rê

For å regne ut hvor langt noe har beveget seg, kan vi multiplisere fart med tid. Hvis vi vet at en bil har kjørt med farten 80 km/h i 2 timer, kan vi regne ut at veien bilen har beveget seg er 160 km:



### Tid:

Ji bo hesabkirina ka tiştekan çiqas herikîye, em dikarin lez bi dem re bi zerpîn. Heke em dizanin ku erebekî bi leza 80 km / h di di 2 saetan rê çuye em dikarin hesab bikin ku durahîya ku erebe çuye 160 km ye:



**Pirsên li ser nivîsê di derbarê lez û lezdanîyê:**

- Ji bo ku em bikarin leza erebeyek hesap bikin dive em çî bi zanin?  
Bersivên yek an jî zêdetir hilbijêrin.
  - Erebe çiqas dûr çuye
  - Erebe çiqas dem bikar anîye
  - Erebe çiqas mezin e
- Yekîneya lez çî ye? Bersivên yek an jî zêdetir hilbijêrin.
  - Km/h
  - m/s
  - $m/s^2$
- Lezdanî çî ye? Yek bersiv hilbijêrin.
  - Leza herî mezin ku tiştêk dikare here.
  - Yekîneyek pîvandina ka tiştêk çiqas bi lez diguhere
  - Tiştêk çiqas dûr di meşê
- Yekîneya lezdanî çî ye? Yek bersiv hilbijêrin.
  - m
  - km/h
  - $m/s^2$
- Formula lez ji bo çî tê bikaranîn? Bersivên yek an jî zêdetir hilbijêrin.
  - Lez ê hesap bikin
  - Hesab bike ka tiştêk çiqas dûr diçe (rê)
  - Hesabken ka di dirêjahiya demek bi sinor de mirov çiqas dem bikar tîne. (dem)